

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



sal:1984

hejmar:16





Zarok fekiyên Malane

## RASTO Û XWARO (2)

Rasto kera xwe ajot û berê xwe da wê bîra ku ava wê ji bo kîza pâşê a dîn, derman e! ewa ku sîxur saloxê wê dida. Gava ku Rasto gihişt ser bîrê, barê kerê danî, bêhna xwe berda di peyre dewla xwe daxiste bîrê û kun tijî av kir, kun xiste ferek têrê û têra dîtir jî kevirek xistê ji bo ku berberî hev bibe, tim bi milekî ve nekeve û xwar nebe.

Rasto bi rê ket û berê xwe da şikefta ku rojî saloxdana wê dida. Pir neçû Rasto gihişt şikeftê, dît ku, bi rastî di şikeftê de gelek tîst û mişt ê hêja hene. Barê kera xwe danî û dîsa bêhna xwe berda, nan xwar av vexwar û kera xwe jî êm da.

Piştî bêhvedanê Rasto ew kevirê ku di hêlek têrê de bû derxist û avêt, li şûna kevir zîv û zérên ku, di şikeftê de hebûn xiste xurcika xwe, dîsa bar li kerê kir û bi rê ket, berê xwe da bajarê paşayê qız dîn.

Dibêjin: Rasto li nava bajêr kolan bi kol'an, cî bi cî digere û band dike:  
-Hê! hê, hê! ez im, ez bêhişan bi hiş dikim dînan bi aqil dikim.....

Rasto çend denga bang kir û bêhneke xurt gerya.Saloxê wî li nav bajêr belav bû.  
Bi kurtepista xelkê li hev gerandin ku,yekî derwêş dînan bi aqil dike,bêhişan bi his tîne.

-Lawo ma ev dîn bûye,ê ne niha wê paşe bibihîze,Ev car ku qîza paşê bi aqil nebe wê rebeno bê kuştin...

Bi vî awayî yek kirin çar,çar kirin çar-deh peyv li hev gerandin û berdevka salox-dan gihadin paşê.

Gava ku paşê bihîst,derhal ferman kir ku ewê dînan bi aqil dike bigrin û bînin. Nexweşıya keçikê paşê pir bêhteng kiribû.

Dibêjin du lşegerê paşê bi dû Rasto ketin ew zû dîtin,bê peyv destên Rasto girtin û birin dîwan ê.Paşe gote Rasto:

-Xortê hêja,saloxên te ji min re dan ku, tu dînan bi aqil dikî,bêhişan bi his tîni ma rast e ?

Rasto lê vegerand:

-Belê paşayê min,rast e

Paşê got:

-Xorto,qîza min nexweş e,tim di hindur de ye,yêñ ku qîza min di wî halî de bibîne û qîza min sax neke,ez serêñ wan jê dikim.



Min xanî ji serî û cendekan dagirtine.Qîzamin cilêن xwe diqetîne û pirê caran tazî ye. Eger tu bi xwe ne bawer bî,ez zorê li te nakanim,tu serbest î.

Rasto gote paşê:

-Ez qîma xwe pê tînim paşayê min.Ez,ji ewênu,serên wan hatine birîn ne çêtir im.Xwedê emrê te(temenê te) dirêj bike paşayê min yan ezê bi ser şopa yêن berê dim,yan jî ezê qîza paşê sax bikim,ferman bide da ku min bibin ba nexweşa min.

Dibêjin paşê ferman kir û leşgeran Rasto birin cem keçik ê.Qîza paşê weke hercar kincêن li xwe tev zîtol-zîtolî kiri bûn, Laşê wê tev li wê rastê xuya dikir,dilê meriv bi halê wê dişewitî.Gava ku Rasto kete hindur keçikê êrîşî ser Rasto kir. Rasto tasa ava xwe berî ku biçe hindur amade kiri bû,bi êrîşâ keçikê re Rasto tasa avê bi ser ser û laşê keçikê reşand.Çaxa av gihişte keçikê lerizî,çavêن wê fireh bûn xwe da hev û cardin êrîşî Rasto kir.Rasto tasa avê ya diduyan jî peçikand ser..û cara sisiyan keçik ji nû ve li hal û perişaniya xwe hay bû,qêrîn pê ket û xwe avêt erdê û got:



-Ez ketim bextê mîrên çê,ez ketim bextê  
te starekê bavêje ser min,min biparêze...

Keçik bêhiş ket,Rasto ew nixumand û mizgîn  
şand ji paşê re ku keça wî sax bû....

(Dumahîk heye)

## M È V A N

Carekê mîvanek hat malekê, êvar bû. Malê  
şîv li gora xwe çê kiri bûn.

Mîvan û xwedyê malê li ser sifrê rûniştin.  
Xwedyê malê hinek xwar, xwe weke têrxwara  
nîşan da û got:

-Errrrrreekk, lawo ez bûm ga !

Xwedyê malê dixwaze ku mîvan dev ji xwa-  
rinê berde


Xwedyê malê carek din zikê xwe firkand  
û got:

-ayyyyyy...ji gayekî bêhtir zikê min nepixî.

Mîvan xwe negirt û got:

-Xwedê te şîfa bike, wele ez hê nebûme golik...

û xwarina xwe berdewam kir



## ÇİROKA MÎHÊ

Mîhek û berxika xwe li mîrgekê diçêriyan.Ro-viyek ji wê de hat û ji mîhê re got:

-Ji bo çi tu û berxika xwe di vê mîrgê de diçêrin ?ma qey mîrg bê xwediye ? ma tu nizanî ku ev mîrga xalê min gur e ?

Mîhê got:

-Tu kiyî û xalê te gur kiye ? Mîrga xwedê ye ez û berxika xwe tê de diçêrin.De zû ji ber çavên min wenda bibe,tu û xalê xwe bê minet in.

Pozê rovî şewitî,hema çû xalê xwe gur bîne.Mîhê dît ku rewş xirab e,li dora xwe nerî dît ku waye şivanek nêzîkî wê li ber pezê xwe ye.

Mîh çû cem şivan û jê re got:

-Şivano,tu kûçkê xwe du se-etan bi emanetî nadî min ?

Şivan got:

-Tu di ser seran û ser çavan re hatî,çawa ez nadim.

Mîhê kûçik anî û hat.Kûçik got:

-Mîhê,te ez ji bo çi anîm?

Mîhê got:

-Hal û hewala min û rovî ev e.Tu xwe têxe vê koncal ê heta ku rovî û gur bêñ.

Mîhê dabaşa xwe(mesela xwe) ji kûçik re got,kûçik jî bi a mîhê kir.îcar pişta mîhê qewîn e,ew û berxika xwe ketina nav kulîlk û nefela biharê û bi kêf diçêrin.

Piştî qederekê rovî hat û got:  
-Mîhê,te ez û xalê min bê minet kirin,vaye min xalê xwe anî,ma îcar hûnê bi ku de biçin?  
Mîhê serê xwe rakir,dît ku rovî û gur dira-nêñ xwe qîç kirine.

Mîhê got:

-Baş e rovî,tu sûnd dixwî ku ev mîrga xalê te ye ?

Rovî got:

-E,ez ji te re bi çi sûnd bixwim ?

Mîhê got:

-Tuwê sê gavan bavêjî û bêjî bi wê ziyaretê ev mîrga xalê min e,ez ê ji te bawer bikim.

Rovî bi nezanî berê xwe da koncala ku kûçik tê deye û got:

-Ev gavek,du....

Rovî dît ku kûçikek di koncalê deye û serê wî weke serê gayekî ye.Rovî dev ji hejmartinê berda û got:

-Heyran,ez xwedî kufllet im,ez nikarim bêbextiyan bikim.

Kûçik nerî ku rovî zêde naçe,hema rabû û ser di wî û xalê wî gur danî.

Ew perçê perçê kirin, êdì mîh û berxika xwe  
bêtirs çêra xwe domandin.



## ŞÊR ÜROVÎ

Devê gêlî, nav mês e,  
Şêrek dima her mêsê,  
Ü ji tîrsa şêrê har  
Debe lê ne dibû dîhar  
Mabû bê risq û nêçîr  
Mabû qertel û hêşîr  
Terewila dît ha boş e  
Dinê wan bûye doj e  
Her tişt wana bûye qat  
Rabûn û kirin civat  
Pêşî hirçê xeberda  
Go"hûn şêr li erdê xin  
Ezê bi lepa lêxim  
Wexta min qirik lê gest  
Şêrê idî bibe mest  
Gur got"hirçâ derewîn  
Bes derewan biteqîn  
Herkê tu bal şêr zor i  
Çima par ra dikolî  
Wexta tu şêr dibînî  
Şêr hovekî lap zore  
Yê wî qelske ew gure  
Hirçê wir kire arîn  
"Ezê te li zinêr xim  
Herdû çavêن te derxim  
Gurê qelpî situdeq  
Tê biteqî mîna beq  
Wê degê pêra pêra  
Gur hirçêra da çêra  
Devê xweyî çatanî  
Berbi zikê hirç anî  
Bi hêrs lê diarîne  
Ku zik lê bidirîne  
Rovî xwe davê ortê  
Nade herda moletê  
"Malxirabno, wî, şerme  
Niha şêrê bê serme

We vira hevdû xêr e  
Dijminê me tek şêr e  
Hûn hatine civat ê  
Bibhêن giliê ometê  
Hatine alî hev kin  
Nehatine vir şer kin  
Malava, hûn mezin in  
îdî xwedyê zar-jin in  
Hûn bisekinin alîkî  
Ezê bêjim giliķî  
-Be'ra aqil û hiş im  
Tek ez ê şêr bikujim  
Hûn xwe dûr bitelînin  
Û mîranî bibînin  
Rovî poça xwe hilda  
Bestê kete tirada  
Mîna nasê doh na pêr  
Çû sekinî li ber şêr  
U li ber şêr bû daxûl  
Ça belengaz û ça qûl  
GO"tu çar-mekanê me  
Go"tu xwey-xudanê me  
Em bêyî te ne tu tişt in  
Bey pismam û bû pişt in  
Go"zanî apê te me  
Ez birê bavê te me  
Niha dil ha min xastî  
Tera bibim berdestî  
Ku hîç dijmin û nemam  
Nabêjin giliķî xam  
Bi fêlbazî şêr xapand  
Aqil ji serî firand  
Go"şêrê zor, ez heyran  
Wer em tev bikin seyran  
Herin rev û nêçîr ê  
Ez beledim der û rê  
Rovî kubar dimeşe

Fitlê dide nav mêše  
Tê disene ser zerê  
Yan çiye hate ciyê nêçîrê  
Wî nihêrî çavê şér  
Haşa serî kir berjêr  
Mala Hacê û Xatê  
Kesereke tal hatê  
Şér go"apê min aqil  
Te ci derde,te ci kul ?  
-Ez korvim li ser mera  
Ser efata,ser şêra  
Divê hovê pîs,bêkêr  
İdî neman mér û şér  
Bavê teyi rehmeti  
Banzdida ji vi teti  
Mînanî hespê cexur  
Zerêra firgas dikir  
Bira korvim ser mera  
Mér nemane tu yêra  
Li nav êlê,nav gund  
Dewsa mera mane kund  
Boy navekî qazancke  
Ser zerêra firgaske  
Şero çû-hat û firî  
Lê riya zerê ne biri  
Tev zinarê ser zerê  
Şér gulol bû çû jêrê  
E,ji wî şerê yeman  
Perçê mezin herd guh man  
Rovi bi delk aha xwar  
Serê şerê dînî har  
Paşê simêl kaw bada  
Nav mêsê de tirada

Xelîl ê Çaçan Mûradov

Gundê Camûşvanê 1975

## MEYMÛN Û QAZ

Meymûnek li ser darekê rûniştî bû, bi dilxwesi ji xwe re li blûrê dida, awaza wê gelekî xwes bû. Du qaz li dû dengê meymûnê hatin û li binê darê guhdariya dengê blûra meymûnê kirin.

Dilê meymûnê pir xwes bû, di dilê xwe de got: "ev du heval ji bo min çêbûn". Meymûn ji darê hate xwarê û çû cem herdû qaza rûnişt.

Herdû qaza gote meymûnê:

-Me divê em hevaltiya te bikin, ji ber ku, tu hemû dema ya dilxwesiyyêyi û tu awazên xwes lê didî, me jî divê em wekî te bin.

Meymûnê gote qazan:

-Ez razî me û min jî divê ez hevaltiya we bikim, de rabin em ê bi hevre derkevin seyran ê.

Her sê bi hevre derketin seyran ê û geriyan. Demekê meymûnê bala xwe dayê ku qazek çû nav avê masiyek girt û bi tenê xwar, para hevala xwe nedayê.

Meymûnê gote qazan:

-Heger hûn dixwazin wekî min bin, hemû dema dilxwes bin, pêwist e hûn tu cara xwarinê bêyi hev nexwin. Ew masiyê te gava din xwar diviya bû te behra hevala xwe jî bidayê.

Da dilê we jî xweş biwa.

Herdû qazan got:

-Tu rast dibêjî,divê di hemû karê xwe de em  
bi hevre bin

Hersê hinekî din meşîyan.Meymûnê dêna xwe da-  
yê hêlinâ kevokekê li ser darê ye û çêlikê  
kevokê ji hêlinê ketiye erdê.Meymûnê çêlikâ  
kevokê girt û bir kir hêlinê.Di wê demê de  
kevok hat û dêna xwe dayê ku meymûnê çêlikâ  
wê ji erdê rakiriye û kiriye hêlin ê.Kêfa  
kevokê gelekî bi vî karî hat û gelek spasda-  
rê meymûnê bû,Qaz jî bi vî karî dilxweş  
bûn û bi hevre gotin meymûnê:

-Ji îro pê de em ji dil hevalên te ne,em  
tu karî bêyi te nakin,Em bi te re gelekî  
dilxweş in,em bi her awayî bi te re ne,

(Salimê Casimî)

## PEKENİN

### ATATIRK -2-

Rojekê mamosteyekî Tirk diçe gundekî ji yê Kurdan.Dixwaze zarokên Kurdan hînî xwendin û nivîsandinê bike û tiştên li dinê hene bi wan bide naskirin.

Mamoste radibe wêneyêñ(sûretêñ) lawiran (heywanan) şanî şagirtan dide.Şagirt lawiran bi wêneyêñ wan nas dikin.Hinekan jî nas na-kin ji ber ku ew nedîtine.

Mamoste wêneyê şêr şanî wan dide

-Zarokno, ev çi ye ?

-Ew şêr e

-Eferim

-Baş e, ev çi ye ?

-Ew fil e

-Çok yaşa(her bijî)

-Baş e, ev çi ye ?

-Ew çêlek e

-Çok çok yaşa(pir bijî)

Piştî wêneyêñ lawiran diqede,mamoste ra-  
dibe wêneyêñ zilamên mezin yêñ dinê şanî  
wan dide.

Zarok tu kesî nasnakin,ji ber ku kes ne  
dîtine.

Mamoste radibe wêneyê Atatirk şanî zarokan  
dide

Mamoste dibêje:

-Zarokno, ev kî ye ?

Zarok bêdeng dimînin, ji ber ku nas nakin

-Zarokno, ma hûn nizanin bê ev ê mezin kî ye?

-Na wele em nizanin, em nasnakin

Mamoste pir aciz dibe û bi rûyekî tîrs  
dibêje:

-Kuro ma hûn nizanin ku ev Atatirk e ?

Şagirtek radibe ser pê û dibê:

-Ya mamoste, erê me heywan dîtine lê me  
heywanê weke wî nedîtine

## BRÎNDAR



## R O V İ Ü J O J İ

Di wextekî de roviyek û jojiyek hebûn  
Van herdû destbirakan her sal bi hevre za-  
dê xwe diçandin,bi hevre diçinîn,bî hevre  
hiltanîn û bi biratî parvedikirin.

Salekê cardin rovî û jojî genimê xwe  
çandin.Bû havîn,wexta çinîna genim hat.  
Herdûkan rabûn genim çinîn,ew dan ser hev  
û anîn ser bênder ê.

Rovî ji xwe ponijî got:"Bi xwedê îsal ge-  
nimê me pir e,divê ez fenekê li jojî bikim  
da ku evqase genim ji min re bimîne".

Rovî rabû ji jojî re got:

-Ho birakê jojî

-Fermo birakê rovî


-De ka ez û te şertekî bikin

-Ka bêje bê şertê te çiye

-De ka ez û te biçin malê,serê sibê kî .  
ji me zûtir hat ser bênder ê bila evqase  
genim ji wan re be

-De baş e,ez razî me

Rabûn herdiwan xatir ji hev xwestin û berê  
xwe dan malê.Çaxa rovî berê xwe da malê  
hema jojî bi xar hat û xwe di nava loda  
genim de veşart.



Rovî jî çûye malê û ji xwe re dibêje:  
"Howeh..çi jojiyekî ehmeq..ha..ha..ha  
bi tirba bavê min ji niha de ez xwedyê genim  
im, heta jojiyê pepûk hêdî hêdî bimeše û  
xwe li ba de, ez ê li ser loda genim rûnim  
û simbêlên xwe yê qeytanî badim!"

Rovî henekê xwe bi jojî dike û pir kêfa  
wî tê. Lê nizane ku jojî xwe di bin loda ge-  
nim de veşartiye.

Wê şevê xew neket çavêr rovî, ewî hetanî  
sibê henekê xwe bi jojî kir.

Serê sibê roviyê min û te bi kêf rabû  
ser xwe û berê xwe da ser bênderê. Çaxa rovî  
hat ser bênderê jojî dengê xwe nekir. Rovî bû  
tîq-tîqa wî û ji xwe re keniya û dest bi  
govendê kir. Di wê navberê de jojî ji bin  
loda genim derket û got:

-Merheba birakê rovî, çima tu dereng ketî lo ?

Çaxa rovî jojî dît, weke ku cêrek ava  
cemidî bi ser dabe. Roviye reben bi stuxwa-  
rî berê xwe da malê û kêfa wî lê herimî

## WELATÊ MİN

Welatê min çima digrî  
Ez bi heyranê te me  
Ez goriyê navê şêrîn  
Deşt û çiyayêñ te me  
  
Deşt û çiya mîrg û kanî  
Gund û bajar û xanî  
Jiyana te pir xwes e,ez  
Tim bi hesreta te me  
  
Bilind e bejn û bala te  
Navdar e her gelê te  
Jîr in keç û xortêñ te,ez  
Leşgerê ala te me  
  
Kurdistan e navê te  
Dîcle û Ferat çemên te  
Pir şîrîn e ala te,ez  
Her evîndarê te me  
  
Tu gula nava baxan î  
Ez dixwînim li şaxan  
Tu gula nava cîhan î,ez  
îro bilbilê te me  
  
Te dil kiriye birîn  
Tim dike ax û zarîn  
Bi şey û roj dixwînim ez  
Va ye hozanê te me

Va ji bo te dixwînim her  
Tim keseran dikşînim  
Her bi ax û zarînim,ez  
Va Brîndarê te me

BRÎNDAR

20.2.1982



"HEYLO DILLO"

Heylo dilo...  
Emrê dilê min pê re de bajo  
Vê êvarê mi rebenê  
Tu carî li darê dinyayê  
Nabe tu peyabî  
Li ser bozê qesirandî  
Dêl û bijî bi hena bî  
  
Ez tu nifira li bejna delal nakim  
Li beriya Mêrdinê li kepezê kiko erdê  
bê pîva  
  
Bila li delal derkeve xarek, mîna xarê şemera  
swarê seklawî li delêl karbin  
  
Bihustê lawê bavan bi lîre be  
Mêrê xerab ji mûrê çê bi şade be  
Destê xortan dizgînê negir e  
Lingê lawê bavan di rikêbê nasekine  
  
Şad û şûdê delêl gelek hene  
Bû hefadê koçan û kerîyan  
Navê revê li delêl heram e  
Delal were mala, bi mîvane  
Serê stûna konan nêzîk e, ji te bi xuya ne  
Tevdana sîng û berê min esmer ê  
Ji êşa pêva, li nefsa canê delal,  
swarê seklawiya helal be  
  
Di vê êvarê emrê dilê min pê re  
Bila li me nehata ji ba  
Bayê xerbî zineta rûkê dinê  
Va ezê bala xwe didimê, maqûl ê dikîka  
Kişyane oda bavê Bişar  
Sêwr û mişewrê roja barkirinê

Vê êvarê xewa xelkê delal di paşila min da  
nayê  
Nizam delal girtî sar û germe  
Ezê nizam delal nexweş e  
Ez nizanim seklawî li lingê delal ketine  
Nizam warê mala bavê min kevn bûne kêç ketinê

Di vê êvarê, delal, minê ji gira girê kewkeyo  
Ketim rez û koçan û keriyê dikîkan  
Xelkê min ê delal, li ser nag û delûlan  
girtiye tadeyo

Min nihêrî bejna zirav, mîna seklawî,  
seklawiyê bavê Bişar

Li der konê bavê Bişar bisekine bêreşmeyo

Vê êvarê.....

Ezê daketim beriya Mêrdînê, ji dilê min  
rebenê beriya berê

Lê şîn dibû kulîlka qewanê tûmê di xerdelê  
Sala çûyî ez xwesteka xelkê delal bûm  
Sala vê salê ketim tora yekî pîsê mirdar  
Roja barkirinê li dewsâ koç û waran diman  
Darê dergûşê li min bû bela  
Mîrata kitânê, li min rebenê bû baskê qertelê

Vê êvarê.....

Seyda lawikê delal teyr û tivîlkê dora malan  
bû  
Seyda xelkê min î delal xezala serê gelêyo  
Delal de rabe destê xwe bi destê min de  
Emê hevdû birevînin, xwe bidin dora Xabûrê  
Bila girê Mixergan ji min û delal re bibe  
stareyo

Di vê êvarê....

De bajo rê dûro bajo, betilyo bajo, heyiryo  
de bajo

Li ber germiya havînê rûmenê, vê sibekê tiwê  
bigirî sar û germê



Sê birayên min hene, li bin darê çekê,  
roja qewimandinê û kuştinê  
Gava çavê min nekeve li bejna xelkê delal  
Ezê berê xwe bidim, herim Midyadê  
Dawa taqiya xwe bibim cem hoste Melko, ser  
boyaxa reşkirinê

Heylo dilo lo.....

Vê sibekê xelkê min ê delal çû welatê  
biyaniyê

Kesek li malê tunîne ku ez sebra dilê xwe  
pê bînim

Derdê dilê min pir in, şevê qanûna şevine  
dirêj in

Ezê rabim lawik li dergûş xînim  
Ji derdê dilê xwe rebenê bîlorînim, bîlorînim  
Hêstirê xwînê, ser sê biskê dişê, li ser  
hinarkê rûka bîbarînim

De bajo emrê dilê min pêro...

Heylo dilo!.....

Rabin berê xwe bidin welatê Kurdistanê  
Herin Diyarbekra xopan, korta gidiya

Ezê vê sibekê herim, kevirkî rakim ji bedena  
hepsa xwîniya

Ezê wî kevrî têxim navbeyna xwe û ber vi  
dilî

Di pey bejna delal, li welatê biyaniyê  
sebra dilê xwe pê  
bînim

De bajo emrê dilê min pêro tim lo lo!..  
De bajo rê dûro, bajo xempiro

Vê êvarê ji gira girê Girdêşê, girê Girdêşê  
Xelkê min i delal siwar bû ciwanîka beyê  
Berê xwe da xêmê beriya jêrîn

Lingê ciwaniya xelkê delal li keviran  
dikeve

Ezê nizanim teresbavê solbend neçê  
solkiriye

Nava min dişewite, dilêmin pê dêşe de bajo...

Keçikê digot:Lo delal ez ne jin im,ne bi  
mîr im  
Ez xweyinga heft bira me,wekî şêr in  
Dotmama diwanzdeh pismama,siwarên hespêñ  
nêr in  
Gava çavê min li bejna delal nekeve  
Ezê herim binya Nisêbinê  
Her heft bira,diwanzdeh pismama bi carekê  
vedişêrim

Vê êvarê....

Heyla delal,li min û li tilkermê  
Delalê malê siwar bûye,vê rojê vê rogermê  
Ez ne ketim ber etra delalê malê  
Ez ketim ber etra bi şalê spî,bi kirasê  
melesî  
Çûye serê kaniyê,vê sarê,vê saregermê  
De bajo heyiryo....

Heylo dilo....

Ezê diçûm ber derî,derî li min venebû  
Hilkışam ser banê xanî,rê tunebû  
Daketim alikî hewşê,min bala xwe dayê  
Xelka min a delal li bin pencerê  
Di xewa şêrîn de bû  
Temarê li çavên min kiribû  
Ezê bi xwe hişyar ne bûm  
Çûm tewafa sîng û bera,bi kilit û bi mifte  
bû  
Nizam ne si-ûda min vê sibekê,ne bextê te bû

Here heylo....

Vê êvarê xwedêyo,rebiyo,minê tiştek ji te  
navê  
Konekî çarstûnî,çîtik şikakî,navmalê  
Mîkutkî ji dara benavê  
Minê konê delal vegirtiyo  
Li beriya Mêrdinê,li kepazêserê kanyê  
Navrokê Evdiselam ê



Serê te wê bêşe tiwê nexwes bikevî  
Di welatê biyaniyê,bi emelê serê min bî

Haylo dilo.....

Vê êvarê minê çaxir bo bazara şewitî  
Mi ne dixe,bi salixdana,bî çavan ji min dûro  
Sîng û berê min rebenê  
Vê sibekê mîna bexçakî ji bexçê Nisêbinê  
Mîna mîrgê,ji mîrga tilkermê  
Hawik ji hawikê dora Xabûrê  
Emrê dilê min pêro  
Were delal tewafa sîng û berê min rebenê  
Serê xwe deyne rakeve  
Ev stêra li me der bû,stêra,karwangirane  
Serê xwe deyne rakeve,stêra sibê li me dûro

De here heylo dilo.....

Delal tûf terka min bikî ez terka te nakim  
Lo!lo!melûlo xempiro,keserxuro!

De bajo riyate dûro

Îro du ro ji sîng û berê min rebenê mehrûmo  
Xwezîka min xelkê delal bidîta  
Mîna dewr û dewranên ewili,tev selefê bavê

Bîşar

Beriya Mêrdînê li ser pişta hemdaniyê

Vê sibekê li hawikê dora Xabûrò

Heylo.....

Vê êvarê emrê dilê min pê re  
Vê sibekê karê tev bizinê,diçêrin li çiyayê  
şingal ê

Cilêñ delêl hatine ber şûştinê

Ezê bistînim galibek sabûna Helebê

Bişom li ser ava Zîrgane

Bişom,lêkim ava mawerdî,ezê raxim li ser  
dara qurnefile

Di vê êvarê

Kalekî mala bavê me heye,li ber rehma xwedê  
roja barkirinê

Lê,lê Xezal ê.....

Vê êvarê tu xezala min î,xezala binê beriyê  
Devî li çêrê,çavî li karê,guhî li gaziyê  
Heylê xezalê,...

Vê sibekê xwedê bikira miradê min û xelkê  
  delal

Li beriya Mêrdînê,meha Temûz û Tebaxê

Minê rojî bigirta li ser rojiyê

Xwezî ez bibama rimek ji diwanzdeh movika

Têketama ser piyê xelkê delal,siwarê hemdaniyê

Di vê êvarê keçikê digot:dilê min qûma

Ferêt e

Kosara kîka,Amûda rengîn,stûna welato

Ez nakim terka bejna zirav,here serê min

pê re lo...

Hay lo dilo.....

Lo delal,heya gava mirin ê

Heya roja kuştin û qewimandinê,delal heylo

Vê sibekê tirsa min ji wê tirsê ezê bimrim

Li welatê biyaniyê

Berî kalbûnê,pîrbûnê,min têr negot"delal

heylo"

# P È Z A N Î N

Pirs:

-Di sala 1923 yan, 1974 an, 1639 an û di  
sala 1880 î de çi bûyêr li Kurdistanê çêbûne?

Bersiv(.....)

Pirs:

-Navê şerkerekî Kurd ku xwe padîşahê Kur-  
distanê diyar kiribû

Bersiv(.....)

Pirs:

-Di dîrokê de navê qehreman û mîrxasekî  
kurd

Bersiv(.....)

Pirs:

-Navê zimanزان û alimekî Kurd ku kovara  
"hewar" derxistiye

Bersiv(.....)

Pirs:

-Navê çêlikên kewan

Bersiv(.....)

Pirs:

-Tiştê ku meriv dicû

Bersiv(.....)

$$\begin{array}{r}
 9 \\
 8 \\
 7 \\
 6 \\
 5 \\
 4 \\
 3 \\
 + \quad 2 \\
 \hline
 1
 \end{array}$$


Gelo hûn karin van hejmarêñ jorîn bidin  
ser hev û bikin ku(99999) derkeve ?

Pirs:

-Merivek di cihekî asê de maye.Aliyekî wî behr(derya) e,aliyekî din agir e,aliyê din herî û stirî ne û aliyê din jî ger biçe wê hêrgiz(muhakkak) qeze bê pêşıya wî,  
Gelo wê ev meriv çawa ji nava vî cihê asê derkeve ?

Bersiv(.....)

XACEREZ



X A Ç E P İ R S

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
1										
2										
3										
4										
5										
6										

Çeperast:

- 1-Navê bajarekî Kurdistanê
- 2-Heywanekî nava avê(berepaş)..du tîp..  
gotinek pirsê
- 3-Hevala meriv a jînê...navê jinekê,an ke-  
çekê
- 4-Çaxa meriv alê dadixe
- 5-Navê mîrekî(berepaş)
- 6-~~Kesê bê por (bere paş)~~

Serejêr:

- 1-Xelat,hediye
- 2-sala ku em tê de
- 3-Navê keçek an jinekê
- 4-Gotinek pirsê(berepaş)
- 5-Li hinek ciyan ji goran re dibêjin(b.paş)
- 6-Fermanek ji mirinê
- 7-Navê jin an keçekê(berepaş)

8-Sê tîp

9-Çaxa tiştek a meriv be(berepaş)

10-Ji agir re dibêjin(berepaş) ...tişteki  
xwarinê

Bersiva hejmara 15 an

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	K	U	R	D	I	S	T	A	N
2	É	R	A	Y			A	V	A
3	Y		M	A	Z	↑		A	Z
4	H		Ü	R	I	S			Ê
5	U	A	S		V			S	
6	S	P	A	S		H	E	B	Ü
7	R	O	N	A	H	↑		A	R
8	E		R	Ü	M	E	T		
9	W	E	Z	↑	R		M	Ê	R

Bersiva pêzanînên hejmana 15 an

Bersiv-1  
(Wêneguhêz)

Bersiv-2

(Pêlweş)

Bersiv-3.

(Ji 31 tîpan)

Bersiv-4

(Agirî)

Bersiv-5

(Selahaddîn Eyubî)

Bersiv -6

(Jana zirav-êşa zirav)

Bersiv-7

(Ferhat)

Bersiv-8

(Ciwange)

Bersiv-9

(Di sala 1938 an şerê Dersim, 1947 an kambaxkirina komara Mahabad ê, 1975 an têkçûyina şoreşa başûrî Kurdistanê)



UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr  
BIHA